

## Li Tirkîyeyê di du heftayên dawîn de...

15-31 Cotmeh, 2023

### 15ê Cotmehê, 2023

**Çar kesên ku beşdarî Kongreya Partiya Çep a Kesk bûn ji aliyê Serdozgeriya Enqereyê hatin binçavkirin.**

Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê ragihand ku piştî 4emîn Kongreya Asayî ya Partiya Çep a Kesk [navê partiyê wekî Partiya Wekhevî û Demokrasiyê a Gelan (HEDEP) hat guherandin] ku li Salona Sporê ya Enqereyê hat lidarxistin, çar kes hatin binçavkirin.

Walîtiya Enqereyê di daxuyaniya xwe ya der barê mijarê da wiha got: "Di kongreyê de sloganên rêxistina terorê ya cudaxwaz hatin qîrîn û posterê serokê wê hat vekirin, bi vê yekê ve girêdayî li ser talîmata Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê çar kes hatin binçavkirin û derbarê wan de lêpîrsîna edlî hat destpêkirin.

Walîtiya Enqereyê (Twitter) - <https://x.com/AnkaraValiligi/status/1713558609617997971?s=20>

Rûdaw - <https://www.rudaw.net/turkish/middleeast/turkev/1510202311>

Anadolu Ajansı - <https://www.aa.com.tr/tr/qundem/yesil-sol-parti-kongresinde-teror-orqutu-elebasinin-posterini-acan-4-kisi-gozaltina-alindi/3020956>

### 17ê Cotmehê, 2023

**Serdozgeriya Tunceliyê ji ber strana ku di Festîvala Mûnzûrê de got û gotinên wê yên li ser dikê der barê hunermend Şevîn de lêpîrsîn da destpêkirin.**

Muzîkjen Şevîn di Festîvala Çand û Xwezayê ya Munzurê de konser da, ji ber ku di konserê de strana bi navê 'Şervano' got û biryara qedexekirina sehneyê ya li Grup Yorumê rexne kir, der barê wê de lêpîrsîn hat vekirin.

Di 21emîn Mihîrcana Çand û Xwezayê ya Munzurê ya di navbera 3-6ê Tebaxa 2023an de pêk hat de Grup Yorum, Grup Isyan Ateşî û Koma Gel a Veradardz dê derketina ser dike. Lê belê, Walîtiya Tunceliyê derketina ser dike li wan qedexe kir.

Hunermend Şevîn derbarê lêpîrsîna ku bi hincetên "pesindana sûc û sûcdar" û "propagandaya rêxistina terorê" hat vekirin de, diyar kir ku polîsan girtiye ser danişgehên li ser navê wê tomarkirî. Bi ser de hemû parvekirinên wê yên li ser hesabên wê yên medyaya civakî di dosyeya lêpîrsînê de cih girtine. Şevîn, di domahiya axaftina xwe de anî ziman ku strana bi navê Şervano ji aliyê hunermendên Suriyeyî ve derbarê êrîşên DAIŞê de hatiye çêkirin û wê gelek caran ev stran li ser dike gotiye.

Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/munzur-festivaline-katilan-sevine-sorusturma-haber-1642713>

Platforma Çavdêriya Azadiya Hunerê - <https://www.reportare.com/soz/munzur-festivaline-katilan-sevine-sorusturma/>

**20ê Cotmehê, 2023**

### **Walîtiya Tunceliyê li Dêrsimê 5 rojan hemû çalakîyên civakî qedexa kir**

Li Dêrsimê ji daxuyaniyên çapemeniyê bigire heta civîn û xwepêşandanan, bibîranîn, çalakîyên rûniştinê û nobetên bi vî rengî, vekirina standan, belavkirina broşuran, daliqandina pankart û afîşan, konferans, konser û çalakîyên bi vî rengî ji 20ê cotmehê heta nivê şeva 24ê cotmehê ji bo pênc rojan dê girêdayî destûra amirê reveberiya mulkî be.

Qedexeya bi heman rengî ya berê ku ji aliyê walîtiyê ve di 12ê Cotmeha 2023an de hatibû destpêkirin, 5 roj berê 15ê Cotmeha 2023an nivê şevê bi dawî bûbû.

Walîtiya Tunceliyê di daxuyaniya xwe ya fermî de diyar kir ku bi mebesta "temînkirina ewlehiya giştî ya bajêr", di nav sînorên Tunceliyê de li kuçe, kolan, qad, rê û parkan, çalakîyên wekî daxuyaniyên çapemeniyê, civîn û xwepêşandan, mîfîng, civînên li qada vekirî, protesto, çalakiya rûniştinê, bîranîn, grevên birçîbûnê, vekirina standan, kampanyayên îmezayan, konser, mîhrîcan, belavkirina belavokan, vekirina pankart û afîşan, pêxistin û hilgirtina meşaleyan, konferans, nîşandana sînevîzyonê û hwd. hatine qedexekirin.

Walîtiya Tunceliyê - <http://www.tunceli.gov.tr/kurumlar/tunceli.gov.tr/Duyurular/2023/duyuru.pdf>

TRT Haber - <https://www.trthaber.com/haber/quncel/tuncelide-basin-aciklamalari-ve-etkinlikler-5-gun-sureyle-izne-baglandi-805641.html>

### **Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê der barê nûçegihana TRTyê Elif Akkuş de biryara girtinê da.**

Rojnameger Elif Akkuş bi biryara Dadweriya Cezaya Sulhê ya Enqereyê hat girtin. Elif Akkuş di 17ê Cotmeha 2023an de bi îdiaya ku derbarê nelirêtiyên di TRTyê de agahî daye hesabeke medyaya civakî hatibû binçavkirin,

Akkuş di Gulana 2023an de bêyî ku hincetek bê ragihandin ji bo sê mehan ji karê xwe yê TRTyê hatibû bidûrxistin. Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê der barê nûçegihana şer a TRTyê Elif Akkuş de bi hinceta "desteserkirin an belavkirina agahiyên şexsî", "gef", "şantaj" û "buxtan" lêpîrsin dabû destpêkirin.

Akkuş di 17ê Cotmehê de hat binçavkirin. Di binçav de, ji ber nexweşiya wê ew rakirin nexweşxaneyê. Dema ku li nexweşxaneyê dihat dermankirin îfadeya wê hat girtin. Parêzerê Akkuş Huseyîn Ersoz li ser hesabê xwe yê medyaya civakî ragihand ku piştî îfadeyê, dozger biryara binçavkirinê bi dawî kir, lê piştê biryar hat dayîn ku Akkuş di bin çavdêriya polîsan de bibin edliyeyê.

Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê ji rêveberiya nexweşxaneyê û Midûriyeta Emnîyetê ya Enqereyê re nameyek nivîsand da ku Akkuş ji nexweşxaneyê sewqî edliyeyê bê kirin. Parêzer Ersoz diyar kir ku muwekîla wî bi nezareta polîsan birin edliyeyê. Ersoz wiha domand: "Di mejiyê wê de stent heye, xetereya emboliyê pê re heye û tansiyona wê bilind e."

Akkuş "bi daxwaza girtinê" sewqî Dadgeriya Cezayê Sulhê ya Enqereyê hat kirin û derbarê wê de biryara girtinê hat dayîn. Akkuş birin Girtîgeha Girtî ya Jinan a Sîncanê.

Li gorî agahiyên Ersozê ku li dijî biryara girtinê nerazibûn nîşan da, "Elif Akkuş bi hinceta ku agahî daye hesabê Xyê ku der barê rêveberên TRTyê de îdiayên 'Nepotîzm û Îstîsmarkirina Çavkaniyên Giştî' parve kiriye, tê sûcdarkirin." Her wiha Ersoz diyar kir ku xwediyê hesabê ku parvekirinên navborî kirine nehatiye binçavkirin.

Birgün - <https://www.birgun.net/haber/gozaltina-alinan-trt-haber-muhabiri-elif-akkus-tutuklandi-477404>

Parêzer Huseyîn Ersoz - <https://twitter.com/ersozhuseyin/status/1717190979952734661>

Dokuz8 Haber - <https://twitter.com/dokuz8haber/status/1715271197535993906>

Cumhuriyet - <https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/elif-akkus-neden-tutuklandi-trt-muhabiri-elif-akkus-kimdir-2131097>

T24 - <https://t24.com.tr/haber/gazeteci-elif-akkus-tutuklandi.1135319>

Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/trt-muhabiri-elif-akkus-sedveyle-girdigi-durumada-tutuklandi-haber-1643340>

## 21ê Cotmehê, 2023, Şemî

### Polîsan destûr neda çalakiya Dayikên Şemiyê ya hefteya 969emîn û 26 kes binçavkirin.

Tevî biryara bînpêkirina mafan a Dadgeha Makezagonî (AYM) Dayikên Şemiyê di hefteya 969emîn de ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin ku çalakiya rûniştinê li Qada Galatasarayê pêk bînin.

700emîn Civîna Dayikên Şemiyê ya di 25ê Tebaxa 2018an de pêk hat bi hinceta "Agahî nehatiye dayîn" ji aliyê Qeymeqamiya Beyoglû ya Stenbolê ve hat qedexeyê, polîsan êrîşî Dayikên Şemiyê yên li Qada Galatasarayê kom bûn, kirin û 23 kes binçav kirin. Piştî der barê 46 kesan de bi îdîaya "Bînpêkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan" doz hat vekirin. Li dû vê yekê, parêzvanên mafan dest bi têkoşîna hiqûqî kir. Di encama vê têkoşînê de Dadgeha Makezagonî biryar da ku astengkirina çalakiya Dayikên Şemiyê bînpêkirina mafan e.

Yek ji Dayikên Şemiyê Maside Ocak, der barê Hêzên Zeptî û amirê wan de serîlêdana sûcî kir. Lê belê Serdozgeriya Komarê biryar da ku hewcedarî bi lêpîrsînê nîne û Dadgeha Cezayê Sulhê ya Stenbolê îfraz red kir, Maside Ocak dosya bir Dadgeha Makezagonî.

Dadgeha Bilind di meha Sibatê de biryar da ku "mafê lidarxistina civîn û xwepêşandanan" hatiye bînpêkirin ku di xala 34emîn a Destûra Bingehîn de hatiye tertîb kirin. Biryar hat dayîn ku 13 hezar û 500 TL zirara madî bidin Maside Ocak.

Piştî, Dadgeha Makezagonî biryar da ku polîsên ku êrîşî xwepêşandana mirovên şemiyê kirin û li Sebla Arcan xistin, qedexeya muameleya xerab û zilmê bînpê kirine. Biryar hat dayîn ku berpîrsiyar bînen darizandin û 50 hezar TL zirara madî ji Arcan re bê dayîn.

Tevî van her du biryarên Dadgeha Makezagonî, parêzvanên mafan li Galatasarayê bi tundiya polîsan tîn astengkirin ku daxuyaniya çapemeniyê bidin.

Polîsan biryara "qedexeyê" ya Qeymeqamiya Beyogluyê weke hincet nîşan da û ji Dayikên Şemiyê û parêzvanên mafan 26 kes binçav kirin.

Mikail Kırbayır, Gulseren Yoleri, Besna Tosun, Ali Newroz, Tosun İrfan, Bilgin Maside Ocak, Eren Keskin, Hasan Karakoç, Leman Yurtsever, Oya Ersoy, İkbâl Eren, Taylan Bekin, Nazım Dikbaş, Ayşegül Devicioğlu, Umit Efe, İsmail Yücel, Davut Arslan, Begali Kurnaz, Doğan Ozkan, İrem Gerkuş, Seher Kalkan, Ezgi Karakuş, Evrim Gurenin, Nazlı Evrim Şerifoğlu, Fatma Akaltun û Sevim Sancaktar piştî pênc saetan hatin berdan.

Dayikên Şemiyê (Twitter) - <https://x.com/CmrtesiAnneleri/status/1715675702421344482?s=20>

T24 - <https://t24.com.tr/video/cumartesi-anneleri-969-uncu-haftada-da-gozaltina-alindi-elimizde-cicek-kolumuzda-kelepce.57343>

## 22ê Cotmehê, 2023

### **Serdozgeriya Komarê ya Eskişehirê 2 stranbêjên dawetê û 21 kesên ku bi wan re stran gotine binçav kirin.**

Hêzên zeptî yên girêdayî Femandariya Cendirmeyan a Parêzgeha Eskişehirê ji ber îxbara ku li Taxa Kireç a navçeya Odunpazariyê di dawetekê de "propagandaya terorê" tê kirin operasyon li dar xistin. Di çarçoveya operasyonê de stranbêjên dawetê û 21 kesên ku bi wan re stran gotine hatin binçavkirin.

Der barê mijarê de Endama Lijneya Berdevkan a Partiya Azadiya Civakî (TÖP) û Wekîla Mêrsînê Perihan Koca agahî parve kirin. Koca diyar kir ku dawet li gundekî ye ku 20 kilometre dûrî navenda bajêr e û piştî salên 1970yî kurdan koç kirine. Dawet meh û nîvek berê pêk hatiye û di çarçoveya lêpîrsînê de binçavkirin û girtina îfadeyan vê hefteyê pêk anîne.

Li gorî agahiyên Koca dane, polîsan bi ser malên gundiyan û her wiha salona dawetê girtine. Her wiha qeydên dawetê jî hatine desteserkirin. 23 kesên ku du ji wan muzîkjenên dawetê bûn, piştî ku bi qasî 9 saetan di şaxa têkoşîna li dijî terorê de mabûn, hatin berdan.

Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/tum-haberler/content/view/221953?page=1>

Platforma Çavdêriya Azadiya Hunerê - <https://www.reportare.com/soz/soylenen-sarki-nedeniyle-duqune-operasyon-23-qozalti/>

NTV - <https://www.ntv.com.tr/turkiye/eskisehirde-duqunde-teror-orqutu-propaqandasina-23-qozalti,dFr-TkPhrUK3RIRBVDJ8Hq>

Rûdaw - <https://www.rudaw.net/turkish/middleeast/turkey/2210202311>

## 25ê Cotmehê, 2023

### **Heyeta dadgehê, Gultan Kışanak a ku maweya herî zêde ya girtîmayîna wê qediyabû, berneda.**

Darizandina Parlamentera heyama 23 û 24emîn û [Hev-]şaredara Bajarê Mezin a Amedê ya hîlbijartî Gultan Kışanak li 22emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê dewam dike. Di 25ê Cotmeha 2023an de bi giştî heyama girtîmayîna Kışanak gihişt 7 salan û maweya herî zêde ya girtîmayîna wê ku di qanûnê de hatiye diyarkirin derbas kir. Heyeta dadgehê tevî serlêdana eleqedar a parêzerên Kışanakê jî biryara berdanê neda.

Gultan Kışanak 2 sal piştî destbiserkirina peywira xwe, dema li derveyî welat hîn bû ku lêpîrsîn der barê wê de hatibû destpêkirin, li welêt vegeriya û di 25ê Cotmeha 2016an de hatibû binçavkirin. Tevî ku dema vegeriya, ji lêpîrsînê agahdar bû jî di 30ê Cotmehê de bi hinceta "gumana revê" hatibû girtin. Di heman lêpîrsînê de Hevserokê Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê Firat Anlı jî li gel Kışanak hat girtin. Di 14ê Tîrmeha 2018an de di sêyemîn danîşîna dozê de hat berdan ku li 8emîn Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê hat dîtin. Serdozgeriya Komarê ya Diyarbekirê li dijî biryara berdanê nerazîbûn nîşan da. 9emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê biryara tehlîyeyê betal kir. Der barê Anlı de biryara girtinê hat dayîn.

Wezareta Karên Hundirîn di 1ê Mijdara 2016an de, 2 roj piştî girtina wê, di şûna Kışanak de Qeymeqamê Eftimesgutê yê wê demê weke qeyûm tayînî Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê kir.

Di doza ku li Dadgeha Cezayê Giran a Meletiyê hat vekirin de Kışanak bi îdiaya "rêveberiya rêxistina terorê" dihat sûcdarkirin. Di encama dozê de dadgehê 14 sal cezayê girtîgehê li Kışanak birî. Li ser îtiraza parêzeran Dadgeha Edliyeya Herêmî ya Antepê biryar betal kir; Ji nû ve darizandinê dest pê kir.

Di pêvajoya ji nû ve darizandinê de ji bo Kişanak jî di çarçoveya lêpîrsîna Kobanê ya sala 2020an de li dijî 108 siyasetmedarên Kurd ku di nav wan de Hevserokên Giştî yê HDPê û endamên Desteya Rêveber a Navendî (MYK) jî hene de biryara girtinê hat dayîn. Ji ber vê yekê Kişanak dema ku di girtîgehê de bû hat girtin.

Kişanak ji 25ê Cotmeha 2023an pê ve heyama 7 salan a ku li gorî xala 102/2 ya Qanûna Daraziya Cezayê (CMK) maweya herî zêde ya girtîmayîne tamam kir.

Gultan Kişanak a ku di hilbijartinên herêmî yê 30ê Adara 2014an de namzeta Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) bû, bi ji sedî 55ê dangan bû [Hev-]şaredara Bajarê Mezin a Diyarbekirê. BDPê ku di van hilbijartinan de 97 şaredarî bi dest xist, di 11ê Tîrmeha 2014an de navê xwe guhert û bû Partiya Herêmên Demokratîk (DBP). Parlamenterên BDPê ku di sala 2008an de hat avakirin, di Hezîrana 2014an de derbasî Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bûn ku di sala 2012an avabû.

Di heyama Rewşa Awarte ku piştî hewldana derbeyê ya 15ê Tîrmeha 2016an hat îlankirin de, bi Biryarnameya di Hukmê Qanûnê de ya jimara 674an de di rêveberiyên herêmî de guhertinên girîng hatin kirin û ji bo şaredariyan tayînkirina "qeyûman" dest pê kir. Wezareta Karên Hundirîn di dawiya sala 2016an de dest bi tayînkirina qeyûman ji bo şaredariyan kir û heta hilbijartinên herêmî yê 31ê Adara 2019an şaredariyên têkildar ji aliyê qeyûmên tayînkirî ve dihatin birêvebirin. BDPê di hilbijartinên 2014an de bi giştî 90 şaredarî bi dest xistibûn. Di vê pêvajoyê de 3 şaredariyên bajarê mezin û 4 şaredariyên parêzgehan bi giştî li 33 şaredariyên di rêveberiya BDPê de bûn qeyûm hatin tayînkirin. Çalakiyên 4 şaredariyên navçeyan bi destûra qeymeqamtiyê ve hat girêdan.

Wezareta Karên Hundirîn piştî hilbijartinên herêmî yê 31ê Adara 2019an tayînkirina qeyûman berdewam kir. Wezaretê hema hema li hemû şaredariyên ku di heyama berê de qeyûm lê hatibûn tayînkirin qeyûm tayîn kirin.

*Evrensel - <https://www.evrensel.net/haber/502367/yasa-acik-sure-doldu-ancak-gultan-kisanak-tahliye-edilmiyor-bu-hukuka-karsi-hiledir>*

*Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/uzun-tutukluluk-suresi-dolan-gultan-kisanak-tahliye-edilmiyor-haber-1644258>*

*Milliyet - <https://www.milliyet.com.tr/siyaset/dbpnin-kazandigi-106-belediyeden-33une-kayyum-atandi-2346505>*

## **27ê Cotmehê, 2023**

### **Polîsan meşa xwendekaran a li dijî bûyera tacîzê ya li Zanîngeha Dîcleyê asteng kir.**

Xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê bi armanca şermezarkirina mirina Zeren Ertaş a di 25ê Cotmehê de li Wargeha Xwendekaran a Guzelhîsar a li Taxa Efeler a Aydinê di asansora ku ket de pêk hat û her wiha bûyera tacîza zayendî ku di 26ê cotmehê de li zanîngeha wan qewimî, li ber avahiya Karên Xwendekaran çalakiya rûniştinê pêk anîn. Gelek xwendekar beşdarî çalakiyê bûn.

Piştî çalakiya rûniştinê ya saetekê xwendekaran xwest ku ber bi Rektoriyê ve bimeşin. Polîsan bi hinceta "kom ji kontrolê derketiye û manîpulyasyon heye" ev daxwaz red kir û mudaxaleyî xwendekaran kir.

Xwendekaran nexwest ku ji qadê derkevin. Li ser vê yekê, Midûrê Wezareta Ciwan û Sporê ya Parêzgeha Diyarbekirê Nuammer Uslu, Serokê Daîreya Veguhastinê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê û rêveberên zanîngehê bi xwendekaran re hevpeyvîn pêk anîn. Rayedaran soza çareserkirina pirsgrêkên curbecur ên xwendekaran li yurd, kafeteryaya zanîngehê û veguhastinê dan, li ser bertekan ji qadê veqetiyên.

*Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/dicle-universitesinde-zeren-ertas-ve-taciz-protostosuna-polis-saldirisi-haber-1644482>*



Evrensel - <https://www.evrensel.net/haber/502158/dicle-universitesi-ogrencilerinden-oturma-eylemi>

## **Walîtiya Wanê meş û civînên li derve, li tewahiya parêzgehê ji bo 2 rojan qedexa kirin**

Walîtiya Wanê, qedexeyên ku berê her meh ji bo 15 rojan dihatin sepandin, ev çend meh in di dawiya hefteyê de pêk tîne.

Walîtiyê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku şert û mercên sînordarkirin û qedexekirinê di makezagon û qanûnan de bi awayekî rasterast û eşkere hene û armanca vê qedexeyê ev in: dabînkirina ewlehiya can û malê gel, ji holê Her wiha, "armanca ew e ku pêşî li belavbûna bûyerên tundiyê bê girtin."

Di daxuyaniyê de hat gotin, "[...] Ji xeynî bûyerên ku ji aliyê walîtiyê û qeymeqamtiyê ve guncav hatine dîtin, di 28 û 29ê cotmehê de ji bo 2 rojan meş û civînên li qada vekirî li gorî bendên Qanûna Civîn û Xwepêşandanan ya hejmar 2911, li gorî bendên têkildar ên qanûnê, lidarxistina daxuyaniyên çapemeniyê, çalakiya rûniştinê û kirina anketan, vekirina kon û standan, organîzekirina kampanyayên îmzekirinê, belavkirina broşur û belavokan li gorî bendên (a) û (c) yê xala 11emîn a Qanûna Îdareya Parêzgehê ya bi hejmara 5442. [...] qedexa ne.

Van Valiliği - <http://www.van.gov.tr/27102023-tarihli-yasaklama-karari>

Serhat News - <https://www.serhatnews.com/vanda-2-gunluk-yasak-karari-vinelandi>

Vanmed - <https://www.vanmed.net/haber/vanda-eylem-ve-etkinlikler-2-gun-yasak-26939>

## **28ê Cotmehê, 2023**

### **Polîsan çalakiya Dayikên Şemiyê ya hefteya 970emîn bi zorê asteng kir; 27 kes hatin binçavkirin.**

Dayikên Şemiyê di sala 1995an de bi armanca aqûbeta xizmên xwe yê ku ji aliyê rayedarên fermî ve hatin binçavkirin û careke din agahî jê nehat girtin an jî mirî hatin dîtin bipirsîn û bi daxwaza darizandina kiryanan dest bi têkoşinê kirin. Tevî hemû zext û tundiyê bê navber nobedariya rûniştinê berdewam kir û di hefteya 970emîn de jî rastî astengiyên polîsan hatin. 27 kesên ji Dayikên Şemiyê û parêzvanên mafan hatin binçavkirin.

Tevî biryara bînpêkirina mafan a Dadgeha Makezagonî (AYM) Dayikên Şemiyê di hefteya 970emîn de bi hinceta biryara "qedexeyê" ya Qeymeqamiya Beyoglûyê ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin ku ber bi Qada Galatasarayê bimeşin.

700emîn Civîna Dayikên Şemiyê ya di 25ê Tebaxa 2018an de pêk hat bi hinceta "Agahî nehatiye dayîn" ji aliyê Qeymeqamiya Beyoglû ya Stenbolê ve hat qedexkirin. Li ser biryara qedexeyê, polîsan erîşî Dayikên Şemiyê yê li Qada Galatasarayê kom bûn, kirin û 23 kes binçav kirin. Piştî der barê 46 kesan de bi îdfaya "Bînpêkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan" doz hat vekirin. Li dû vê yekê, parazvanên mafan dest bi têkoşina hiqûqî kir. Di encama vê têkoşinê de Dadgeha Makezagonî biryar da ku astengkirina çalakiya Dayikên Şemiyê bînpêkirina mafan e.

Yek ji Dayikên Şemiyê Maside Ocak, der barê Hêzên Zepî û amirê wan de serîlêdana sûcî kir. Lê belê Serdozgeriya Komarê biryar da ku hewcedarî bi lêpîrsînê nîne û Dadgeha Cezayê Sulhê ya Stenbolê îfraz red kir, Maside Ocak dosya bir Dadgeha Makezagonî.

Dadgeha Bilind di meha Sibatê de biryar da ku "mafê lidarxistina civîn û xwepêşandanan" hatiye binpêkirin ku di xala 34emîn a Destûra Bingehîn de hatiye tertîb kirin. Biryar hat dayîn ku 13 hezar û 500 TL zirara madî bidin Maside Ocak.

Piştire, Dadgeha Makezagonî biryar da ku polîsên ku êrîşî xwepêşandana mirovên şemiyê kirin û li Sebla Arcan xistin, qedexeya muameleya xerab û zilmê binpê kirine. Biryar hat dayîn ku berpirsiyar bên darizandin û 50 hezar TL zirara madî ji Arcan re bê dayîn.

Tevî van her du biryarên Dadgeha Makezagonî, parêzvanên mafan li Galatasarayê bi tundiya polîsan tên astengkirin ku daxuyaniya çapemeniyê bidin.

Polîsan biryara "qedexeyê" ya Qeymeqamiya Beyoglu'yê weke hincet nîşan da û ji Dayikên Şemiyê û parêzvanên mafan 26 kes binçav kirin.

Mikail Kırbayır, Gulseren Yoleri, Besna Tosun, Ali Newroz, Tosun İrfan, Bilgin Maside Ocak, Eren Keskin, Hasan Karakoç, Leman Yurtsever, Oya Ersoy, İkbâl Eren, Taylan Bekin, Nazım Dikbaş, Ayşegül Devocioğlu, Umit Efe, İsmail Yucel, Davut Arslan, Begali Kurnaz, Doğan Ozkan, İrem Gerkuş, Seher Kalkan, Ezgi Karakuş, Evrim Gurenin, Nazlı Evrim Şerifoğlu, Fatma Akaltun û Sevim Sancaktar piştî pênc saetan hatin berdan.

Cumartesi Anneleri (Twitter) - <https://x.com/CmrtesiAnneleri/status/1718212711744507995?s=20>

Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/GUNCEL/content/view/222611>

Sözcü - <https://www.sozcu.com.tr/2023/gundem/aym-hukmune-karsin-cumartesi-annelerine-yine-mudahale-27-kisi-gozaltinda-7844486/>

## 29ê Cotmehê, 2023

### Polîsan mamosteya ku li Antalyayê di pîrozbahiya Cejna Komarê de axaftineke rexneyî kiribû binçav kir

Li Antalyayê, mamosteya Ziman û Edebiyata Tirkî ku dibistaneke taybet dixebite Emîne Karakaş di çalakiyên 100emîn Salvegera Komarê de axivî û li ser pênaseya "Sedsala Tirkîyeyê" ya ku ji aliyê hikûmetê ve weke axaftineke propagandayê dihat bikaranîn, axaftineke rexneyî kir. Axaftina wê li ser medyaya civakî gelekî bal kişand. Kesên nêzî hikûmetê yên ku ji axaftina Emîne Karakaş aciz bûn, li ser medyaya civakî Karakaş kirin hedef.

Heman şevê di saet 22.00an de ekîbên Midûriyeta Şaxa Ewlehiyê ya Midûriyeta Ewlehiyê ya Antalyayê Emîne Karakaş ji mala wê binçav kirin. Karakaş ku bi îdîaya "Gel berpêyî kîn û dijminatîyê kiriye" hat sûcdarkirin, di 30ê Cotmehê de piştî îfadeyê bi şertê kontrola edlî hat berdan.

Sözcü - <https://www.sozcu.com.tr/2023/gundem/emine-ogretmen-turkiye-yuzvili-konusmasi-nedeniyle-gozaltina-alindi-7847103/>

Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/okulda-yaptigi-konusma-ile-hedef-gosterilen-ogretmen-serbest-birakildi-haber-1645032>

**30ê Cotmehê, 2023**

**Rayedarên dadweriyê parlementerê hilbijartî Can Atalay bernadin.**

13emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê biryara Dadgeha Makezagonî a bînpêkirina mafan a der barê Wekîlê Partiya Karkerên Tirkîyeyê (TÎP) yê Hatayê Can Atalay de bi cih neanî û biryar ji 3yemîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind re şand. Dadgehê bi hinceta ku ev bînpêkirin ji biryara Dadgeha Bilind pêk hatiye, îdia kir ku dadgeha bilind e ku divê biryarê bide.

Parêzer Can Atalay di hilbijartinên giştî yên 14ê Gulana 2023an de ku weke namzetê TÎPê ketibû hilbijartinê bû parlementerê Hatayê. Dema Atalay bû namzed û piştê jî wek parlementer hat hilbijartin, yek ji wan 8 bersûcên ku bi Osman Kavala re di doza Geziyê de dihatin darizandin bû. Di 26ê Nîsana 2022an de di doza Geziyê de, 13emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê bi îdiaya "hewldana hilweşandina hikûmetê" cezayê miebedê li Osman Kavala birî, her wiha bi sûcdariya "alîkariya hewldana derbeyê" li 7 bersûcên ku Atalay jî di nav de 18 sal cezayê girtîgehê birî. Dadgehê biryar da ku heft bersûc bê girtin. Di heman dozê de biryara dadgehê ya beraetê ji aliyê Dadgeha Bilind ve hat betalkirin û doz ji nû ve dest pê kiribû.

Can Atalay dem adi girtîgehê de bû di hilbijartinên 14ê Gulanê de ji TÎPê wekî Parlamenterê Hatayê hatibû hilbijartin. Lê belê 3yemîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind bi hinceta ku parêzbandiya wan a qanûnî heye, daxwaza rawestandina dozê û berdana Atalay red kir. Heyetê di 28ê Îlona 2023an de jî cezayê Osman Kavala, Can Atalay, Mine Ozerden, Çigdem Mader û Tayfun Kahraman erê kir.

Li ser vê yekê Can Atalay serî li Dadgeha Makezagonî da. Dadgeha Destûra Bingehîn di 25ê cotmehê de li ser serîlêdanê niqaş kir û biryar da ku mafê hilbijartin û xebata siyasî û mafê azadî û ewlehiyê yê şexsî hatiye bînpêkirin. Dadgeha Makezagonî ku biryar da 50 hezar TL tazmînat bide Atalay, ji bo encamên bînpêkirinê ji holê rabike nusxeyek biryarê ji 13emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê re şand.

Dadgeha Makezagonî ji 13emîn Dadgeha Cezayê Giran xwest ku biryara ji nû ve darizandinê bide, înfaza Can Atalay rawestî. Bi taybetî hat xwestin ku biryara berdanê û rawestandina darizandinê bide.

Hêvî ew bû ku dadgeha herêmî ji 25ê Cotmehê ve biryara Can Atalay bi cih bîne. 13emîn Dadgeha Cezayê Giran a Stenbolê 30ê Cotmehê di saetên êvarê de biryara xwe da. Dadgehê biryara bînpêkirina Dadgeha Makezagonî a der barê Atalay de pêk neanî û biryar da ku dosya ji 3yemîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind re bê şandin. Wekî hincet ji bo biryarê wiha hat gotin: "Li gorî rêzîknameyên navborî, biryara bînpêkirinê ya bi serîlêdana takekesî ya li Dadgeha Makezagonî ve girêdayî, ne têkildarî biryara Dadgeha me ye. Têkildarî biryara Dadgeha Bilind a ji bo redkirina daxwaza berdanê ya ji aliyê Odeya Cezayê ya têkildar ve hatiye dayîn e. Dema ku dosya li ber Odeya eleqedar bû, serlêder wekî parlementer hat hilbijartin. Bînpêkirina ku mijara serîlêdana takekesî ye ji biryara vê Odeyê derketiye. Her wiha piştî ku serîlêdana takekesî hate kirin, dosya li ser esasê wê hate lêkolîn kirin û ji aliyê Odeya Cezayê ya têkildar ve biryar hate girtin. Ji ber vê sedemê li hemberî rewşa nû ya hiqûqî, pêwîst e ji aliyê 3emîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind ve nixandineke nû bê kirin. Ji ber vê yekê dosya ji Serdozgeriya Komarê ya we re hatiye şandin.

Dema ev metna hincetê ya Dadgeha Cezayê Giran a 13emîn di çapemeniyê de hat weşandin, derket holê ku di belgê de tenê îmzeya serokê dadgehê Mesut Ozdemîr heye, heyeta dadgehê nîne û dîroka biryarê jî li şûna 30ê Cotmehê, wekî 13ê Cotmehê hatiye nivîsandin. Dadgeha Makezagonî di 25ê cotmehê de biryara bînpêkirinê ya li ser serîlêdana eleqedar dabû.



Serokê dadgehê Mesut Ozdemîr diyar kir ku sedema yek îmzeyê ew e ku yek ji heyeta dadgehê ya ji 3 kesan pêk tê di betlaneyê de ye û endamên din jî ji ber nexweşiyê ji bo 3 rojan bi destûr in. Derket holê ku endamê bi destûr, namzetê parlementeriyê yê AKPê Murat Bîrcan e. Dadgehê her wiha nameyeke din a bi dîroka 30 Cotmehê nivîsand, û got ku şaşiya dîrokê "bi xeletî" hatiye kirin.

Ev biryara dadgeha herêmî dê bibe sedem ku pêvajoya berdana Can Atalay dirêj bibe. Tê payîn ku Dadgeha Bilind biryara binpêkirina Dadgeha Makezagonî binirxîne û biryarê bide. Her wiha îhtîmal heye ku 3emîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind dosyayê ji nû ve bişîne dadgeha herêmî. Her wiha ger biryara binpêkirinê neyê tetbîqkirin divê Can Atalay careke din serî li Dadgeha Makezagonî bide.

BBC Türkçe - <https://www.bbc.com/turkce/articles/cd1jq15070xo>

DW Türkçe - <https://www.dw.com/tr/can-atalay-karari-yargitay-ucuncu-daireye-havale/a-67259666>

VOA Türkiye - <https://www.voaturkce.com/a/aym-nin-can-atalay-kararina-uymayan-istanbul-agir-ceza-mahkemesi-topu-yargitay-a-atti/7333468.html>

Medyascope - <https://medyascope.tv/2023/10/30/can-atalay-hala-tahliye-edilmedi-dosyaya-gecici-hakim-bakacak/>

Tele 1 - <https://tele1.com.tr/mahkeme-aymnin-can-atalay-kararina-uyyadi-heyet-adaleti-yargitaya-pasladi-942141/>

### **Wezaretê Malbat û Xizmetên Civakî biryar da ku gihaniya nûçeyên derbarê keça Êzîdî ya ku ji aliyê DAIŞê ve hatiye revandin, asteng bike.**

Wezaretê Malbat û Xizmetên Civakî ji bo nûçeyên Hale Gonûltaş ên di 25ê Cotmeha 202'an de di Arti Gerçekê de hatine weşandin asteng bike serî li 10emîn Dadgeha Cezayê Sulhê ya Enqereyê da. Sernavê nivîsê wisa bû: "Li Tirkiyeyê cara ewil: DAIŞê yê ku zarokeke Êzîdî revand wê ji ber bazirganiya mirovan bê darizandin". 10emîn Dadgeha Cezayê Sulhê ya Enqereyê bi biryara xwe ya 30ê Cotmeha 2023an û bi hejmara 2023/8505an a têkildarî serlêdana Wezaretê, hem nûçeyên di Arti Gerçekê de hatine weşandin û hem jî nûçeyên ku behsa nûçeyên Arti Gerçekê dikin asteng kirin.

Halê Gonûltaş, di 26ê Cotmeha 2023an de bi sernavê "Wezaretê Malbatê zaroka Êzîdî teslîmî malbata DAIŞê kir ku ew revandibû û dabû ber firotinê" nûçe weşand. Di vê nûçeyê de Gonûltaş cih dide belgeyekê ku di 21ê Hezîrana 2022an de bi erêkirina Wezaretê Malbat û Polîtîkayên Civakî bi destê rayedarên Mala Evînê ya Pursaklarê bi "rapora radestkirinê" keça Êzîdî radestî malbata DAIŞê hatiye kirin.

Di Sibata 2021an de, li Enqereyê, polîs û fîmên îstixbaratê bi operasyonekê girtin ser maleke şaneyî ya DAIŞê û keçeke Êzîdî rizgar kirin. Bi vî awayî pêvajoya darizandinê dest pê kir. Piştî operasyonê agahiyek çapemeniyê de cih girt ku DAIŞîyan zarok li ser înternetê daye ber "firotinê".

Piştî operasyonê, bi hinceta ku keçeke Êzîdî revandine û di mala xwe de dîl girtine, îfadeyên welatîyên Iraqî A.V., N.H.R, û S.A.O hatin girtin. Ji girtiyên A. V. û N. H. R. di 27ê Sibatê de piştî îfade û lêpîrsînên li dozgeriyê bi şertê kontrola edlî hatin berdan, S. A. O. jî hat girtin û ew birin Saziya Cezayê ya Girtî ya Tîpa Fyê ya Sîncanê. (Li saziyên cezayê yê tîpa Fyê, kesên sûcê li dijî civak, dewlet û organên dewletê dikin û her wiha kesên ku sûcê firotina narkotîkê û qaçaxçîtiyê dikin tînan girtin.)

Di îdianameya dozgeriyê ya ku di 8ê Adara 2021an da hat qebûl kirin, her sê endamên DAIŞê bi sûcên "endamtiya rêxistina terorê ya DAIŞê" û " cihgirtina di rêvebirina rêxistinê de" hatin sûcdarkirin. Li gorî îdianameyê, endamê DAIŞê S.A.O. di sala 2018an de bi hevîna birayê xwe re çûye Îdareya Koçberiyê ya Enqereyê û ji bo keça xwe ya Êzîdî serlêdana nasnameyê kiriye. Di serlêdana xwe de diyar kirine ku zarok,

zaroka birayê wî yê mezin û hevîna wî ye, lê di wergirtina nasnameyê de dereng mane. Ji zarokê re bi navê birayê wî û bi hejmara 990....6990 nasname hatiye derxistin.

Eşkere bû ku S.A.O. li ser agahiyên ku keçeke êzidî revandiye û bi qaçaxî anîye Tirkiyeyê, bi îdiaya ku "bazirganiya mirovan a navneteweyî" kiriye, dihat darizandin. Lê, di Tebaxa 2021ê de hatiye berdan.

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/quncel/aile-bakanligi-ezidi-kiz-cocuqu-haberine-erisim-engeli-karari-aldirdi-271152h>

Hale Gönültaş (Twitter) - [https://twitter.com/hale\\_gonultas/status/1719415153081434449](https://twitter.com/hale_gonultas/status/1719415153081434449)

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/quncel/turkiyede-bir-ilk-ezidi-cocuqu-kaciran-isdli-insan-ticaretinden-yarqilanacak-270416h>

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/quncel/aile-bakanligi-kacirilarak-satisa-cikarilan-ezidi-kiz-cocuquunu-isdli-aileye-270452h>

İfade Özgürlüğü Derneği (İFÖD) - <https://ifade.org.tr/engelliweb/devlet-korumasina-alinan-ezidi-cocuqun-kendisini-kaciranlara-teslim-edilmesiyle-ilgili-haberler/>

### 31ê Cotmehê, 2023

#### Darizandina, der barê pêşandan û temaşekirina filme Pride de, dest pê kir

Endamên Kolektîfa Sînemayê ya Weqfa Lêkolînên Zanist Estetîk Çand û Hunerê (BEKSAV) di doza ku bo pêşandana film dihatin darizandin de cara ewil derketin pêşberî dadger.

Kolektîfa Sînemayê ya Weqfa Lêkolînên Zanist Estetîk Çand û Hunerê (BEKSAV) di çarçoveya çalakîyên Meha Serbilindiyê ya 2023an de dê di 7ê Hezîranê de li Kadikoya Stenbolê de filmê "Pride" bida pêşandan. Lê belê Qeymeqamtiya Kadikoyê pêşandan qedexe kir. BEKSAVê ragihand ku dê biryara qedekirinê nas nekin. Li ser vê yekê, Polîsan avahiya BEKSAVê dorpêç kirin û çar endamên BEKSAVê ku bo müzakereye derketin derve û çar kesên ku bo pêşandanê hatibûn binçavkirin.

Der barê kesên di 14'ê Îlonê de hatibûn binçavkirin doz hatibû vekirin. Danişîna ewil a doza ku bi giştî 8 kes bi îdiaya "dijberiya Qanûna Civîn û Xwepêşandanan a Hejmar 2911" dihatin darizandin li 45emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Kartalê hat dîtin. Endamên BEKSAVê di parastina xwe ya der barê sûcdariyê de gotin, "Dema ku bi polîsan re muzakere dihat kirin derb li wan hat xistin û hatin binçavkirin". Wan wiha îfade kirin ku "BEKSAV hunera civakparêz dike" û di vê çarçoveyê de wan ev film nîşan dane. Bersûcên din ên ku ji bo temaşekirina filmê hatin jî gotin, "Ji bo temaşekirina filmê çûne BEKSAVê, polîsan asteng kiriye", "Bi biryara qedexeyê nehatine agahdarkirin", "Di bin îşkenceyê de hatine binçavkirin". Parêzeran jî diyar kirin ku çalakî mafekî bingehîn e û beraeta muwekilên xwe xwestin. Dadgehê danişîna dozê taloqî 30ê Çileyê 2024an kir.

Filmê Derhêner Matthew Warchus, Pride(Rûmet) qala biryara aktîvistên LGBTI+ dike ku di sala 1984an de di dema serokwezîrtiya kevneparêz Thatcher de piştgirî didin greva Yekîtiya Neteweyî ya Karkerên Madenê ya li Îngilîstanê û behsa têkoşîna ku ji hêla du beşên civakî yê dijber ve tê meşandin dike.

Susma 24 - <https://susma24.com/beksav-uyeleri-hakim-karsisinda/>

DW Türkçe - [https://twitter.com/dw\\_turkce/status/1719392537025400972](https://twitter.com/dw_turkce/status/1719392537025400972)

## **Gihaniya nûçeyên derbarê doza "Operasyona Peyarêyê" hat astenkirin. Di dozê de Sedat Bucakê ku tekilî gosirmetiya Susurlukê bûye tê darizandin**

Gihaniya nûçeyên der barê "Operasyona Peyarêyê" de ku di sala 2007an de hatin weşandin, bi biryara Dadgeha Cezayê Sulhê ya Siwêregê ya bi hejmar 2023/2588an a di 31ê Cotmeha 2023an de, di çarçoveya mafê jîbîrkirinê de hat astengkirin.

Di sala 2007an de Ewlekariya Enqereyê li navçeya Çankayayê li dijî kesên ku bi çek, gef li xweyî û xebatkarên xwaringeh, bar û cihê kar ên luks xwarin û sûd ji wan wergirtine, serdegirtinek pêk anî. Operasyona Peyarêyê ku Sedat Bucak û 16 kes hatin binçavkirin ku piraniya wan ji eşîra Bucak bûn, di 18ê Hezîrana 2007an de pêk hat. Wê demê xebatên hîlbijartinê dewam dikirin. Di heman rojan de biryara erêkirinê ya Dadgeha Bilind a der barê Sedat Bucak de jî hat dayîn. Di danişîna 16ê Adara 2010an de Sedat Bucak ji doza Operasyona Peyarêyê beraat kir. Di dozê de 20 kesên ku dosyayên wan piştî operasyonê hatin berhevkirin hatin darizandin; Sedat Bucak jî di nav de 10 kesan beraat kir, 8 kes ji ber sûcên cuda hatin cezakirin, dosyayên 2 kesên firar jî hatin cudakirin.

Bucak dema ku parlementerê Partiya Rêya Rast a Şanliurfayê bû di êvara 3ê Mijdara 1996an de li ser rêya Balikesir-Bursa, herêma Susurluk Çatalcevîzê qezaya trafikê pêk derbas kir û ji wesayîte bi birîndarî xilas bû. Hat diyarkirin ku 3 kesên din ên di heman wesayîte de mirin; midûrê polîsan Huseyîn Kocadag, serokê mafyayê Abdullah Çatli û Gonca Us bû. Li ser Kocadag û Us nasnameyên sexte hebûn.

Di pêvajoya darizandinê de ku piştî qezayê dest pê kir, şopên têkiliyên dewlet-polîs-mafyayê derket holê. Êrîfîya Sedat Bucak hat rakirin. Wê demê, der barê Abdullah Çatli de biryara girtinê hebû û tevî ku Bucak bi vê yekê dizanibû agahî nedabû rayedaran û ew veşartibû. Serdozgeriya Komarê ya Enqereyê der barê de Bucak de bi hinceta ku cihê Çatli veşartiyê, ji bo kirina sûc rêxistin ava kiriye û li gel wî gelek çek hebûne îdianame amade kir. Di doza ku bi navê Doza Susurlukê tê zanîn de ji 11 salan heta 20 salan bi daxwaza cezayê hepsê yê giran dihat darizandin. Lê belê darizandin encax dema Bucak di sala 2002an de weke parlamenter nehat hîlbijartin hat destpêkirin.

Bucak di Doza Susurlukê de beraet kir, lê Dadgeha Bilind biryara beraetê betal kir. Dema doz ji nû ve pêk hat, Bucak hin agahî û belgeyên ku bi hinceta "sira dewletê ne" ji raya giştî re nehatine eşkerekirin pêşkêşî dadgehê kir. Dema 8emîn Daîreya Cezayê ya Dadgeha Bilind sal û pazdah roj cezaya wî erê kir, Sedat Bucak di hîlbijartinê giştî yê 22ê Tîrmeha 2007an de bû namzetê parlementeriyê yê Şanliurfayê yê rêza 1emîn. Bucakê ku yek ji serokên eşîra Bucakan bû ku yek ji eşîrên herî mezin ên Şanliurfayê ye, li bajêr xwedî potansiyelek mezin a dengdanê bû, lê ji ber ku Partiya Demokrat benda hîlbijartinê derbas nekir nikaribû bikeve meclisê. Serokê Giştî yê Partiya Demokrat ê wê demê Mehmet Agar bû ku di dema gosirmetiya Susurlukê de Wezîrê Karên Hundir bû û piştî gosirmetiye neçar ma îstifa kir.

*Ifade Özgürlüğü Derneği (İFÖD) - <https://ifade.org.tr/engelliweb/kaldirim-operasyonu-davasi-hakkindaki-haberler/>*

*Hürriyet - <https://www.hurriyet.com.tr/qundem/sedat-bucaka-kaldirim-operasyonundan-beraat-14129267>*

*BirGün - <https://www.birgun.net/haber/jitem-kimlikli-ankara-cetesi-34280>*

*Cumhuriyet - <https://www.cumhuriyet.com.tr/haber/kaldirim-operasyonu-davasi-34510>*

*BBC Türkçe - <https://www.bbc.com/turkce/haberler-turkiye-57230730>*

*Haber 7 - <https://www.haber7.com/quncel/haber/494799-kaldirim-operasyonu-davasinda-karar>*

## **Ji Walîtiya Kocaeliyê, ji bo astengkirina meşa bi daxwaza zimanê kurdî bibe dersa mecbûrî û zimanê fermî, qedexekirina bi giştî**

Komeleya Tevgera Zimanê Kurdî bi daxwaza ku kurdî bibe zimanê fermî û dersa mecbûrî ji Stenbolê heta Enqereyê meşek li dar xist. Çalakvan dê ji Kocaeliyê jî derbas bibûna lê li wir meş hat qedexekirin.

Di daxuyaniya ku ji aliyê Walîtiya Kocaeliyê ve hat dayîn de hat diyarkirin ku li gorî parvekirinên serok û endamên Komeleya Tevgera Zimanê Kurdî yê li ser hesabên medyaya civakî ew ê ji sînorên parêzgehê dest pê bikin ber bi Enqereyê ve bimeşin û balê bikişînin ser mafên zimanî yê Kurdî.

Di vê çarçoveyê de di daxuyaniyê de hat ragihandin ku ji bo "ewlehiya neteweyî, parastina ewlekariya giştî û nîzama giştî" hin biryar hatin girtin:

Li gorî bendên (a) û (c) yê xala 11emîn a Qanûna Îdareya Parêzgehê ya bi hejmara 5442 û Zagona meşên

"Li gorî bendên (a) û (c) yê xala 11emîn a Zagona Îdareya Parêzgehê ya hejmar 5442an û xala 17an a zagona civîn û xwepêşandan a hejmar 2911an, her cure (meş, civînên vekirî û girtî, daxuyaniyên çapemeniyê) ku di nav sînorên parêzgeha Kocaeliyê de di vê çarçoveyê de bîna lidarxistin; her cure çalakiyên wekî; çalakiya rûniştinê, vekirina standan, kampanya îmzeyan, vegirtina konan, pêxistina meşaleyan, belavkirina belavokan, ketina parêzgehê ya wesayî û kesên ku ji bo piştgiriya bidin vê çalakiyê tîna, çalakiyên protestoyî û hwd ji 31ê Cotmehê saet 00.01an heta 6ê Mijdarê saet 23.59an bo 7 rojan qedexe ye."

Kocaeli Valiliği - <http://www.kocaeli.gov.tr/yuruyus-yasagi>

Gazete Duvar - <https://www.gazeteduvar.com.tr/kocaeli-valiliginden-kurtce-onlemi-7-gunluk-yasak-karari-alindi-haber-1645059>

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/guncel/kocaeli-valiliginden-kurt-dili-hareketi-demeginin-yuruyusune-yasak-271134h>

## **Polîsan li Eskîşehîrê xwendekarên ku xwestin balê bikişînin ser xwekuştina xwendekaran binçav kirin**

Li Eskîşehîrê xwendekaran ji bo balê bikişînin ser xwekuştinê ciwanan xwest heta wargeha KYKê ya ku xwendekara Zanîngeha Anadoluyê S.N.R lê dima ku di 23ê Cotmeha 2023an de xwe kuşt. Polîsan destûr neda meşê. Dema xwendekaran biryar da ku bimeşin wargehê, polîsan mudaxale kir. 4 xwendekar hatin binçavkirin.

BirGün - <https://www.birgun.net/haber/eskisehir-de-kyk-ye-yurumek-isteyen-ogrencilere-polis-mudahalesi-gozaltilar-var-480132>

Evrensel - <https://www.evrensel.net/haber/502486/eskisehirde-kykye-yurumek-isteyen-ogrencilere-mudahale-4-ogrenci-gozaltina-alindi>

## **Taloqkirin û betalkirina berdanan**

Zagona bi hejmar 7242an a der barê înfaza tedbîrên ceza û ewlehiyê de ku di 15ê Nîsana 2020an de ket meriyetê, di figreya 3emîn a xala 18emîn a zagona guherîna di hin qanûnanan de û figreya 5emîn a xala 89emîn a zagona bi hejmar 5275an a derbarê Bicîanîna Tedbîrên Ceza û Ewlekariyê de, di derbarê reftara baş a birêkûpêk û nirxandina helwest û reftarên mehkûman de guhertin pêk anîn.

Ev guhertin ji 1ê Çileyê 2021ê ve, piştî Rêzîknameya Navendên Çavdêrî û Tesnîfkirin û Nirxandina Mehkûman ku di 29ê Kanûna Pêşîn a 2020an de ket meriyetê, dest pê kir. Li gorî guhertina têkildar, li jineyên îdarî û çavdêriyê yê Saziyên Înfaza Cezayê – girtîgeh – her şeş mehan carekê mehkûman dinirxînin û biryarê didin ka ew xwedî reftara baş in. Lijneya ku kesên bi 10 sal û zêdetir cezayê hepsê tîna mehkûmkirin û kesên ku ji sûcên terorê,

sûcên damezrandin, rêvebirin an endambûna rêxistinê û sûcên ku di çarçoveya xebatên rêxistinê de hatine kirin dinirxîne, ji aliyê dozgerê komarê ve tê birêvebirin.

Sê xalên Rêzîknameya Navendên Çavdêrî û Tesnîfkirin û Nirxandina Mehkûman "reftarên baş" wek yek ji şertên pêwîst ji bo serbestberdana bi şert pênase dike, di paragrafa (i) de tê gotin ku Desteya Rêvebir û Çavdêriyê dê "poşmaniya" mehkûman a ji ber sûcê ku kiriye binirxîne.

**\* Dozger biryara betalkirinê nas nekir; Biryara berdan bi şert a girtiyê 30 salan xera kir**

Mehkûmê 68 salî Mehmet Şîrîn Gumuş ê ku li Girtîgeha Tîpa F a Hêjmar 2 a Ewlehiya Bilind a Îzmîrê bi 30 sal cezayê girtîgehê dihat ragirtin, ji ber cezayên wî yên hucreyî, nehat berdan.

Gumuş piştî ku di 9ê Tebaxa 1993an de li Îzmîrê di serdegirtina mala wî de li ser îfadeyên şahidan hat binçavkirin, hat girtin. Di rûniştina doza ku ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ve hat kirin de, bi hinceta "hewl daye ku hin xaka di bin serweriya dewletê de ji rêveberiya dewletê veqetîne" cezayê mubetê lê hat birîn.

Tevî ku diviyabû Gumuş di 9ê Tebaxê de bihata berdan jî, piştî bidawîbûna dema înfazê, dozgeriya Înfazê bi hinceta ku cezayên hucreyî lê hatine birîn, biryara berdana bi şert bi cih neanî. Li gorî vê yekê Gumuş dê 6 salên din jî di girtîgehê de bimîne.

Parêzerê Gumuş, Abdûlhadî Çetîn, der barê 8 cezayên cuda yên hucreyê ku di dîrokên cuda de li muwekilê wî hatine birîn, serî li Serdozgeriya Komarê ya Karşiyakayê da. Di encama van îtirazan de çar cezayên çar hucreyî hatin betalkirin; Ji 4 cezayên mayî yek jê hat înfazkirin û ji bo 3 cezayên din jî pêvajoya îtirazê dewam dike.

Avukat Çetîn, müvekkili hakkında verilen şartlı tahliye kararının geri alınması kararından sonra "iyi hal"inin değerlendirilerek şartlı tahliyesi için 23 Haziran 2023'te Karşiyaka 2'nci İnfaz Hakimliği'ne yeni bir başvuru yaptı. Başvuruyu değerlendiren İnfaz Hakimliği, inceleme sonucu bu talebi kabul etti.

Avukat Çetîn, kararın kesinleşmesinin ardından uygulanması için görüştükleri cezaevi savcılığının İnfaz Hakimliği'nin kararını tanımadığını belirtti.

Parêzer Çetîn piştî biryara betalkirina biryara berdana bi şert a ji bo muwekilê wî hat dayîn, di 23ê Hezîrana 2023an de ji bo serbestberdana bi şert û merc bi nirxandina "raftara wî ya baş" serî li 2yemîn Dadweriya Înfazê ya Karşiyakayê da. Dadweriya Înfazê ya ku serlêdan nirxand, di encama lêkolînê de ev daxwaz qebûl kir.

Parêzer Çetîn, diyar kir ku serdozgeriya girtîgehê ya ku ji bo bicihanîna biryarê bi wan re hevdiştin pêk anîn, piştî ku biryar bi dawî bû, biryara Dadweriya Înfazê nas nekir.

*Evrensel: <https://www.evrensel.net/haber/501243/30-yillik-mahpusun-infazi-yakildi-savci-iptal-kararini-tanimadi>*

*Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/tum-haberler/content/view/221424?page=3>*

**\* Saziya Înfazê ya Cezayê ya Girtî ya Tîpa Tyê ya Yozgatê ya 2yemîn cara duyemîn biryara berdana bi şert a Alî Şen betal kir.**

Biryara serbestberdana bi şert a Alî Şen ê ku 30 sal in li Girtîgeha Tîpa Tyê ya 2yemîn ya Yozgatê girtî ye, bi rapora Lijneya Îdare û Çavdêriyê cara duyemîn hat betalkirin. Dihat payîn ku Şen di 26ê Cotmehê de bê berdan.

Îsmail Şen bertek nîşanî taloqkirina înfaza bavê xwe da û anî ziman ku li jneyê ji bavê wî pirsên wekî "Tu PKKyê wekî rêxistina terorê dibînî?" û "Tu poşman î?" ji bavê wî pirsîn û pê ve girêdayî biryara berdanê betal kirin.



Şen ku di sala 1993an de li Mêrsînê hat binçavkirin û girtin, ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ve bi îdiaya "Endamê rêxistina terorê ye" û "Xerakirina yekîfî û tevahiya dewletê" cezayê mubbetê lê hat birîn. Şen ku li girtîgehên Meletî, Yozgat, Konya, Eskîşehîr û Tarsûsê mabû, niha li Girtîgeha Yozgatê ye.

Dihat payîn ku Alî Şen di 12ê Tîrmeha 2023an de bê berdana Malbata wî ya li Mêrsînê dijî, dem ali ber Yozgatê li bendê bûn, hîn bûn ku biryara berdana bi şert a Alî Şen xera bûye.

Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/GUNCEL/content/view/222559?page=3>

Evrensel - <https://www.evrensel.net/haber/494547/30-yillik-tutuklu-ali-senin-tahliyesi-ertelendi>

**\* Lijneya Rêveberî û Çavdêriyê ya Saziya Înfaza Cezayê bi hinceta ku "poşmanî nîşan nedaye" biryara berdana Abdurrahîm Yazol a bi şert betal kir.**

Li rêveberê Rêxistina Navçeya Esenlerê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Abdurrahîm Yazol ku di sala 2018an de li taxa Esenler a Stenbolê bi îdiaya "endamê rêxistinê ye" hat girtin, heft sal cezayê girtîgehê hat birîn.

Yazol di Saziya Înfaza Cezayê ya Girtî ya Tîpa Tyê ya Manîsa Akhîsarê de dihat girtin. Dema înfazê ya Yazol di 6ê Cotmeha 2023an de bi dawî bû.

Kesên ku ji ber sûcên rêxistinî, sûcên kuştin, sextekarî û diziyê tên girtin an jî ceza li wan tên birîn li girtîgehên tîpa Tyê tên ragirtin.

Lijneya Rêveberî û Çavdêriyê ya Saziya Înfaza Cezayê ya Tîpa Tyê ya Manîsa Akhîsarê bi hinceta ku "poşmanî nîşan nedaye" biryara berdana bi şert betal kir. Yazol wê 9 mehên din jî di girtîgehê de bimîne.

Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/GUNCEL/content/view/222590?page=2>

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/guncel/hdpli-yoneticinin-tahliyesi-dokuz-ay-ertelendi-pismanlik-dayatmasi-270748h>

**\* Rêveberiya Saziya Înfaza Cezayê ya Yozgatê bi hinceta ku "Rewşa baş nîşan nedaye" cara sêyemîn Sinan Sutpak berneda**

Sinan Sutpak ê ku di 3ê Gulana 1993an de hat girtin û di doza ku der barê wî de hatibû vekirin de cezayê mubbetê lê hat birîn, tevî ku înfaza xwe temam kiriye jî nayê berdana.

Sutpak 30 sal û 6 meh di girtîgehê de ma û înfaza wî di 3ê Gulanê de bi dawî bû. Bi hinceta ku "Rewşa baş nîşan nedaye" ji aliyê rêveberiya Girtîgeha Yozgatê ve cezayê wî 3 mehan hat dirêj kirin. Di meha Tebaxê de jî bi heman hincetê nehat berdana û cezayê wî 3 mehan hat dirêj kirin.

Di rapora Lijneya Rêveberî û Çavdêriyê ya Saziya Înfazê ya Cezayê de ku bû sedema taloqkirina berdane, hincet wiha hatin rêz kirin:

"Enerjiya wî ya jiyane kêma, piştî ketina girtîgehê têkiliya xwe ya bi rêxistinê re qut nekiriye, nebûye îfrafkar, dev ji ramanên xwe yên radîkal bernedaye, bi awayekî vekirî rêxistinê wekî 'rêxistina terorê' bi nav nake, poşman nebûye, meylar e ku sûc pêk bîne..."

Mezopotamya Ajansı - <http://mezopotamyaajansi35.com/GUNCEL/content/view/222717?page=5>

Artı Gerçek - <https://artigercek.com/guncel/30-yillik-tutuklunun-ucuncu-kez-tahliyesine-itirafci-olmadi-engeli-270904h>

## Tebinî ji dozên ku tên şopandin:

### **Doza Onur Hamzaoglu û yên din (19ê Cotmehê, 2023)**

Ji ber daxuyaniyên wan ên der heq operasyona leşkerî ya li ser herêma Efrînê ya Sûriyeyê derbarê hevberdevkê Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) û Akademîsyenê aştiyê Onur Hamzaoglu, Cîgira Serokê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Bîndestan (ESP) û Berdevka Meclîsa Jinên Sosyalîst (SKM) Fadîme Çelebî, Hevserokê Partiya Veavakirinê ya Sosyalîst (SYKP) Ahmet Kaya, Hevseroka berê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Serpîl Kemalbay, Hevberdevka HDKê Gulîstan Kiliç Koçyîgît, Cîgira Hevseroka Giştî ya Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) Hacer Ozdemîr, Berdevka Platforma Piştewaniya Sosyalîst (SODAP) Kezban Konukçu Kok, Hevserokên Partiya Pêşerojê ya Çep û Keskan Naci Sönmez û Özlem Eylem Tuncaeli, Hevseroka Partiya Veavakirinê ya Sosyalîst (SYKP) Tulay Hatimogullari û Serokê Partiya Şoreşger û Parlamenterê HDPê yê Stenbolê Musa Piroglu de di sala 2018an de bi hinceta ku gel berpêyî kîn û dijminatîyê kirine û propagandaya rêxistina terorê kirine doz hat vekirin. 12'emîn danîşîna dozê di 19ê Cotmeha 2023an de li 29'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê pêk hat. Dozger di nêrîna xwe de diyar kir ku divê dosyaya Kezban Konukçu Kok a ku di hilbijartinên giştî yên 14ê Gulana 2023an de wek parlamenter hat hilbijartin, bê veqetandin. Derbarê bersûcên din jî anî zimên ku hêmanên sûc di warê propagandaya rêxistina terorîst de pêk nehatine. Lê divê ew bi sedema ku gel berpêyî dijminatîyê dikin bînan cezakirin. 13yemîn rûniştina dozê wê di 10ê Çileyê 2024an saet 10.00an de pêk were.

### **Doza Cem Sarisuluk û yên Din (19ê Cotmehê, 2023)**

84 kesên ku di nav wan de Endamên Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û Cem Sarisuluk jî hene, bi hinceta dijberîkirina Qanûna Civîn û Xwepêşandanan, li 28'emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Enqereyê doz hat vekirin. Cem Sarisuluk û yên din li ber Edliyeya Enqereyê bi daxuyaniya çapemeniyê pêvajoya darizandina polîsên ku Ethem Sarisuluk qetil kirin, protesto kiribûn. Doza ku danîşîna wê ya ewil di 22yê Çileyê 2018an de pêk hat, ev 27 danîşîn in berdewam dike. Di rûniştina 27'emîn a di 19ê cotmehê de pêk hat de biryar hat dayîn ku dosya ji bo mutaleyê ji Serdozgeriya Komarê re bê şandin. Rûniştina dozê dê di 5ê Kanûna 2023an saet di 13.45an de bi 28'emîn rûniştina dozê bidome.

### **Doza Dayikên Aştiyê ya Wanê (20ê Cotmehê, 2023)**

Di 30ê Nîsana 2019an de duyemîn danîşîna doza ku 9 'Dayikên Aştiyê' yên tînan darizandin pêk hat. Dayikên aştiyê tevî malbatên ku ji bo girtî û mehkûmên di greva birçîbûnê û rojîya mirinê de li ber deriyê Girtîgeha bi Ewlehiya Bilind a Wanê, hatibûn cem hev. Dayikên Aştiyê bi hinceta ku daxuyaniya çapemeniyê ya bê destûr dane û "Qanûna Civîn û Xwepêşandanan bînpê kirine" û li ser navê rêxistina terorê sûc kirine, tînan darizandin. Danîşîna biryarê ya dozê di 23ê Kanûna 2022an de li 4emîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê pêk hatibû. Dadgehê ji ber Qanûna Civîn û Xwepêşandanan ya bi hejmara 2911 bînpê kirine biryara beraetê da. Lê bi îdiaya "Her çi qas ne endamê rêxistinê bin jî, bi zanebûn û dilxwazî alîkarî dane rêxistina terorê ya çekdar" 2 sal û mehek ceza li wan birî. Ceza hatin taloqkirin. Piştî ku biryar di îstinafê hat betalkirin, pêvajoya ji nû ve darizandinê dest pê kir. Yekemîn danîşîna dozê ya ji nû ve di 8ê Hezîranê de pêk hat. Di danîşîna duyemîn a di 20ê Cotmeha 2023an de dozger der barê bersûcê ku di dema darizandinê de jiyana xwe ji dest da de biryara betalkirinê da û xwest bersûcên din jî ji ber sûcên hatine binçavkirin cuda bînan cezakirin. Ji bo parêzerên bersûc parastina xwe amade bikin danîşîn taloqî 18ê Çileyê 2024an hat kirin.

### **Doza Fırat Akdeniz - Diyarbakir (20ê Cotmehê, 2023)**

10emîn Dadgeha Asliyeyê ya Amedê der barê 30 kesên ku di 17ê Tîrmeha 2017an de ji bo şermezarkirina ji karavêtinên li saziyên cemaweriyê protesto bikin çalakiya rûniştinê li dar xistibû doz vekir. Di nav wan de rêveberê berê yê IHDê ya Şaxa Amedê Fırat Akdenîz jî heye. Di danişîna ku di 20ê Cotmehê de li Dadgeha Cezayê Giran pêk hat de hemû bersûc hatin berdan. Dadgehê her wiha biryar da ku der barê du bersûcan de piştî ku biryar bi dawî bû, di çarçoveya xalên 32/1 û 32/2 yên qanûna jimare 2911 de giliyê sûc bê kirin.

Li gorî bendên 32/1, 32/2 yên Qanûna Civîn û Xwepêşandanan a hejmar 2911, "Eger kesên ku beşdarî civîn û xwepêşandanên neyasayî dibin, tevî hişyarî û bikaranîna hêzê li ser belavnebûna xwe israr bikin, ji 6 mehan heta sê salan bi cezayê girtîgehê tînin cezakirin. Eger ev sûc ji aliyê kesên ku civîn û xwepêşandan organîze dikin ve were kirin, cezayê ku li gorî van xalan tê birîn bi rêjeya nîvî zêde dibe.

"Ger ku li hemberî hêzên înfazê bi hêz an jî gefxwarinê tevî hişyarî û bikaranîna hêzê li ber xwe bidin, wê ji ber sûcê ku di xala 265an a Qanûna Cezayê ya Tirk a bi hejmar 5237an a 26.9.2004an de hatiye diyarkirin jî bînin cezakirin."

### **Doza Adalet Kaya - Diyarbakir (25ê Cotmehê, 2023)**

Li seroka berê ya Komeleya Jinan a Rosa Adalet Kaya ji ber xebatên wê yên di çarçoveya çalakiyên komeleyê de dikirin bi hinceta endamtiya rêxistinê doz hat vekirin. Di danişînê de ku di 25ê Cotmehê de li 11emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê pêk hat, dadgehê biryar da ku daxwaza parêzerên bersûc a ji bo rawestandina darizandinê bişînin dozgeriyê û daxwaza rakirina kontrola edlî hat redkirin. Doz dê di 4ê Adara 2024an de berdewam bike.

Di danişîna 12ê Hezîrana 2023an de biryar hatibû dayîn ku belgeyên derbarê hilbijartina Adalet Kaya ya wekî parlamentera Serdema 28an a YSPê ya di hilbijartinên giştî yên 14ê Gulanê de ji Lijneya Hilbijartinê ya Amedê û Sekreteriya TBMMyê were xwestin. Danişîn taloqî 25ê Cotmeha 2023an hatibû kirin.